**PDKÎ û Komelê daxuyaniyek hevbeş belav kirin**

»»»» R:7




*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (312) 22-10-2017 Buha (1000) Tûmen*




**Daxûyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq rewşa Mihemed Nezerî**

»»»» Dom R:9

**Kerkûk û sê rastî**

»»»» Dom R:2



## Dagîrkirina Kerkûkê ji aliyê Heşda Şe`ibî û Spaha Pasdaran ve

»»»» R:4



## Sergotar

# Kerkûk û sê rastî

N: Kerîm Perwîzî

Karesata van dawiyane ku di Kurdistana Başûr de bi ser Kurd de hat, renge yek ji mezintirîn karesatên dîroka Kurd be, ku heya peravên gihîştina bi hinek ji xewnên xwe nêzîk bibe, lê ji nişkêve ew ji xevê veciniqandin, û xewnên wan kirin kabûs! Ew terajidiya tal ya Kerkûkê sê rastî selimandin bo me:

Yekem: Li gora hinek ji teoriyan dibêjin ku Rojhilata Navîn jeopolîtîka cîhanî ye, ku her ew “dilbûn” jî bûye sedema vê ku berdewam di lêdanê de be, û ew lêdan jî rûdaw û terajidî û hemase li pey wê tên. Renge bo heta-heta navçe seqamgîriyê bi xwe ve nebîne, jiber ku seqamgîrî wate êdî ew dil ji lêdanê bikeve, ku wê demê navçe bi tewahî wêran bibe, û dilê wî dimire, yan jî dilê cîhanê bo cihekî din tê veguhastin, û Rojhilata Navîn hêdî-hêdî lêdanên xwe kêm dike.

Duyem: Di vê dilê jeopolîtîk a cîhanê de, Kerkûka tejî ji neft, serçaweya xwînê (heman neft) bo dil û di rastî de bo cîhanê ye, û bi watayeke din di Rojhilata Navîn de jî, Kerkûk dilê jeopolîtîk a Rojhilata Navîn e. Di vê dilê navçeyê de jî, neft bûye sedema malwêraniya bo xelkê, û xêr ji vê neftê nedîtine, û qet jî xêrê jê nabînin, meger yê ku dewleta xwe hebe, û ew jî dewletek ku nefta xwe neke çek û teqemenî û…hwd, belkû neftê bike dabînkirina jiyaneke asûde ji bo xelkê, û geşedana demokrasiyê, ku ew jî ji van xewnên xweş e ku di Rojhilata Navîn de, û li rex deryaya neftê de, gellek zehmet e ku ser bigre.

Her deshilatek ku dest bi ser Kerkûkê de bigre, di rastî de dikare dest bi ser Rojhilata Navîn ya beşeke girîng ji Rojhilata Navîn de bigre, û lewra jî gelekomeyeke navçeyî û bi agehdariya zilhêzan jî, bo ser Kerkûkê hate kirin, da ku nekeve bin destê dewletekê bi navê dewleta Kurdistanê de, herwekî ku berpirsên Komara Îslamî piştî karesatê ragehandin ku ew rê nadin kerkûk bikeve destê dijmin de, ku ew jî mezintrîn dijminê Komara Îslamî ye. Niha hemû ekterên piratîkî û eşkere û piştperde li nefta Kerkûkê de beşdar dibin, û bi hevbeşî dixwin, heya ku dil lêdaneke din, û dubare dabeşkirina berjewendiyan û darêtina balansa hêz.


Sêyemîn: Kurdistan bi dirêjahiya dîrokê ew hinda ku min xwendibe, û jê agehdar bim, û renge zor jî lê nezanim, berdewam destewajeyên “terajidî” û “hemse” pêkve hatine. Rûpel bi rûpelên dîroka Kurd, xeteke wê terajidiya ye, û xetek jî hemase ye. Terajidiyaya wê vedigere ser hilkewta coxrafî ya wê, ku rast li ser hezar riyekê cih girtiye, ku li her cihekî dinêre, hin xelk û girûp berbirûyê wê tên, û dixwazin, ku herin cihekî din dagîr bikin, ku ew yek jî li ser rê hilketiye, û derbeyekê lê didin, û terajidiyayek diqewime, her ew derbên berdewam ku erdnîgariya wê jî çiyayî ye, û fêrî berdewam û rawestiyanş kiriye, di derfeteke din de, rabûye, û hemase afirandiye. Ku hekî ew dubare rabûna û ew hemase nebûya, çend hezar sal berî niha Kurd bi tewahî ji nav diçû, tenê diviya tu di nava mozeyan de li pey wan bigerî, lê hertim di nava bûyeran de, beşeke girîng ya guhertinan e.

Lêdana dil di Rojhilata Navaîn de berdewam e, û dabeşbûneweya berjewendiyan û parsenga hêzê jî berdewam e, lewra dîroka kurd jî berdewam e, û gellek caran jî tê ducarîkirin, lê di niha de, ku dewleta Tehranê û Bexdayê yek girtine, lêdaneke dil di navçeyê de renge herduka pêkve bixe!.



## Serokê Herêma Kurdistanê spasiya sekreterê giştî yê PDKÎ kir





**Serokê Herêma Kurdistanê di nameyeke taybetî de, spasiya PDKÎ û sekreterê giştî yê PDKÎ kir.**

Li gora nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, piştî vê ku PDKÎ piştgiriya xwe ji referandona serxwebûna Kurdistanê ragehand, û piştî birêveçûna serkevtiyane ya vê referandomê jî, Mistefa Hicrî sekreterê giştî yê PDKÎ pîrozbahiya vê serkevtina mezin li gelê Kurd û serkirdayetiya siyasî ya Kurdistana Başûr kir, Mes`ûd Barzanî serokê Herêma Kurdistanê di nameyeke taybetî de spasiya vê helwesta PDKÎ kir.

Deqa nameyê bi vî awayî ye:

Birayê rêzdar Kak Mistefa Hicrî

Sekreterê giştî yê PDKÎ

Silaveke germ….

Nameya pîrozbahiya we rêzdarî gihîşte destê me, ku bi boneya serkevtina referandomê û serkevtina vîn û îradeya gelê me, we ji me re şandibû, lewra gellek spasiya we dikim. Min rêz heye bo helwest û piştgiriya we ji daxwazên rewa yên xelkê Kurdistanê.

Gelê Kurdistanê piştî qurbanîdaneke zaf û ezmûna tal, riya xwe hilbijartiye, û ber bi serxwebûnê ve pêngavan davêje, û tu hêz û qavetek nikare rêgir be li pêşberî vîna aştîxwazane û rewa ya gelê kurdistanl.

Hêviya serkevtinê ji we re dixwazim.

**Mes`ûd Barzanî**

**05.10.2017**

# PDKÎ: Em daxwaz dikin ku civatên xelkê Kurd di Kurdistana Îranê de refên xwe yekgirtî bikin, bona berberekaniya digel hovtirîn dijminê xwe, ku Komara Îslamiya Îranê ye.

**Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq stratejiya nû ya Amerîkayê daxûyaniyek belav kiriye, û di vê rastayê de daxwaz ji civatên xelkê Kurd kir, ku refên xwe yekgirtî bikin bona berberekanî digel dijminê xwe yê herî hov ku Komara Îslamiya Îranê ye, bi vî awayî alîkarê cidîtir bin di Rasana Rojhilat û bileziya zêdetir bibexşin bi daketina Komara Îslamî.**

Deqa Daxuyaniyê: Daxuyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ

Stratejiya nû ya Amerîkayê pêwîst e ku çavkaniya terorê hişik bike.

Hevwelatiyên rêzdar!
Herwekî ku hûn agehdar in roja Înê 21`ê Rezbera 1396`an hevberî 13.10.2017`an Tramp serkomarê Amerîkayê stratejiya nû ya Amerîkayê li hemberî Komara Îslamiya Îranê ragehand. Di vê stratejiya nû de, herçend zêdetir bas ji hewlên Komara Îslamî bona destpêregihîştina bi çeka navikî û rexnegirtin ji rêkevtina pêwendîdar bi Îranê û girûpa 5+1 kir, lê li beşeke stratejiya xwe de bas ji hindek xalên bingehîn di siyasetên nedirust ên Komara Îslamiya Îranê de kir.

Em wekî PDKÎ di salên borî de jî, û di pêvajoya rûniştinên cîhanî bo pirsa hewlên Komara Îslamî bo gihîştina bi çeka navikî me ragehandibû ku kêşeya sereke digel rejîmeke serberedayî wekî Komara Îslamî tenê kêşeya hewldan bo gihîştina bi çeka navikî nine, belkû di çend biyavên serekî de, ew rejîm metirsî ye bo ser navçê û cîhanê.

Komara Îslamiya Îranê wekî rejîmeke îdeolojî û serberedayî a ayînî ku tundûtîjî û tawanan di vê navçê de zêde dike, çend dehikek bû ku di nava Îranê de xelkê welat diçewsîne, û bi awayên herî hovane serkut dike. Dijminê hejmara 1 yê hemû neteweyên Îranê ye û bi hezaran tawanî di vê derheqê de xulqandiye, û bi dehan carî, di civînên navneteweyî de, bi sedema binpêkirina mafên civakê û neteweyên Îranê û kêmaniyên mezhebî ve hatiye mehkûmkirin.

Ew rejîma bi pêkanîna Spaha Pasdaran a parêzerê rejîma Wilayeta Feqîhî bona vegeşandina milîşên besîc û piştre pêkanîn û vegeşandina girûpên tundrewên mesebî di navçeyê de, çavkaniya ajawegerî û vegeşandina şerê mesebî bûye, û niha jî wisa ye, di pêxema vegeşandina şer û tevdanîkariyan heya alîkariya El-Qaîde û DAÎŞ, jiber ku Komara Slamî tenê di şerê meshebî de dikare dirêjiyê bide bi mana xwe ya zirarmend.

Komara Îslamî serçaveya terorîzma dewletî û terorîzma navdewletî ye, û karnameya reş ya wê bo hemû cîhanê eşkere ye, û ew bi terora dijberên xwe, û bi terora hêzên Amerîkayî û biyanî nesekiniye, û li pêş hemiyan de di terora azadîxwazên neteweyên Îranê û bi tabetî rêberên Kurd de dest hebûye, û di çend dadgehên cîhanê de hate mehkûmkirin û niha jî hemû cîhan dizane ku terorîzm baştirîn pênase ye bo rejîma Wilayeta Feqîh.

Komara Îslamî her di rojên yekem de û bi dagîrkirina balyozxaneya Amerîkayê, binpêkirina yasayên navneteweyî dest pê kir, wê demê jî di nava Îranê de PDKÎ yekem hêz bû ku ew kiryar mehkûm kir, û ji wê demê ve heya niha û bi dirêjahiya çend dehikên temenê xwe, binpêkirina yasayên navneteweyî û navçeyî bi riya herî baş, û riya domandina siyaset û mana xwe zaniye, û merg û wêranî naweroka vê siyaseta xwe pêk tîne, û digel jiyan û bexteweriya mirov bîhanî ye.

Komara Îslamî nirxeke zaf di pêxema destpêregihîştina bi çeka navikî da, û niha jî bi awayê veşartî dixwaze ku çeka komkuj bi dest bixe, û wê çekê jî tenê bona vegeşandina destêwerdana di nava jiyana hemû xelkê navçê û vegeşandina terorîzmê di hemû cîhanê de dixwaze.

Me pêştir jî ragehandibû ku kêmasiyên serekî ên civînên girûpa 5+1 digel rejîma Îranê ew e ku tewahiya dosiyeya serberedayî û terorîzma Komara Îslamî bi xwe nagre, û tenê li ser perwendeya navikî çirr bûye, û ew yek derfetê dide Komara Îslamî ku bi awayê tundtir di biyavên din de hewl bide, û serkutkirina navxweyî tundtir bike, herwekî ku derbazkirina demê rastiya vê lêkdaneweyê selimand.

Rêkevtina cîhanî li ser dosiya Komara Îslamî tu xêrek bo navçe û neteweyên Îranê tunebûye, belkû bi pereyê taybetî ku di vî warî de, gihaye destê





Komara Îslamî û Spaha Pasdran, bûye sedema pêkanîna derfeta zêdetir bo vê rejîma serkutkar û terorîst, û destêwerdana wan di nava karûbarên welatên navçê de zêdetir kiriye.

Herwisa em li ser vê baweriyê bûn, ku rejîma Komara Îslamî berevajiyê xwe hilkişan û mehtkirina xwe, di navxwe û derve de, ji aliyê xelkê azadîxwaz ê Îran ê û navçê ve wekî rejîmeke tevdanîkar hatiye naskirin, û bi dehan kirîzên civakî û aborî û siyasî berbirûyê wê bûne ku carê di çareserkirina wan de bêçare maye, û lewra jî rejîmeke ku ber bi daketinê ve diçe. Heta di pilînoma 17.emîn ya Komaîteya Navendî de ku di meha Gelawêja îsal de pêk hat, rapora siyasî derheq rejîmê li jêr navê “Komara Îslamî ber bi Daketinê ve” hatibû amadekirin.

Niha jî ku stratejiya nû ya Amerîkayê pêdeçûna bi rêkevtinnameya 5+1 derheq fayla navikî ya Îranê, sependina gemaroyan bi ser Spaha Pasdaran, û çendîn biyavên din bi xwe ve digre, ku rejîma Komara Îslamî ber bi tengeje û astengiya zêdetir ve dibe, û pêvajoya daketinê û lawaziyên wê bileztir dike, ew yek di berjewendiya gelên Îranê û hemû Rojhilata Navîn de ye, lewra em piştevaniyê jê dikin.

Di vê rastayê de em daxwazê dikin, ku civatên xelk Kurdistanê refên xwe yekgirtî bikin, bona berberekaniya digel dijminên xwe, ku Komara Îslamî ye, û bi vî rengî alîkarê micid bin di rasana Rojhilat û bilezîbexşîna bi daketina Komara Îslamî.

Me jêve ye ku wê demê cîhan êmin û navçeya Rojhilata Navîn jî asûde dibe, û neteweyên Îranê dibin xwediyê jiyaneke baştir, ku çavkaniya terorîzmê û tundrewiya ayînî û şerê meshebî ku rejîma wilayeta Feqîh serekîtirîn alîkarê wê ye, bi alîkariya hemû aliyekî bê hişikkirin.

**PDKÎ**

**Deftera Siyasî**

**24.07.1396**
**16.10.2017**

# Hevpeyvînek derheq xebata çandî di Rojhilata kurdistanê de



## Dara Natiq:

## Di Kurdistanê de bi sedema siyaset û stratejiya pilandarêtî ya rejîmê bo asîmîlekirina çanda neteweya me, û milîtarîzekirina Kurdistanê, xebata çandî di Kurdistanê de digel astengiyan berbirû bû




**Rejîma Îranê gellek riyan diceribîne, bona vê ku bikare di navxwe ya Kurdistanê de, nakokiyan û valahiyan bixe nava refên gelê Kurd de. Bêguman yek ji wan ryan, şerê ferhengî ye, û mixabin rejîmê gelle îmkanatên madî û mirovî li ber dest de hene, ku bikare vê siyasetê berdewam bike, lê eva ku gelo rejîm heya çi qasî di vê siyasetê de serkevtî bûye, hewcehî bi berhevdan û şiroveyeye hûr û kûr heye. Di vê derheqê de me bi hewce zanî ku digel Dara Natiq endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ hevpeyvînekê pêk bînin, ku eva jî deqa wê ye:**

**H: Şehram Mîrzayî**

**Pirs: Çima xebata çandî di nava tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd de lawaz e, û me nekariye bi awayê hewce guh bidnê?**

**Bersiv:** Di dirêjahiya dîrokê de, neteweya Kurd hertim bûye armanca pîlanên biyom û dagîrkerane ên welatên mezinhêz û navçeyî, û xebat û mafên wan ên rewa bûye qurbaniyê berjewendî û danûstandinên di navbera welatan de, û hatiye piştguhxistin.

Dagîrkerên Kurdistanê jî bi mifahwergirtina ji wan derfetan, bona jinavbirina nasnameya Kurdî û bi giştî jinavbirina neteweya Kurd, siyaseta cînosayd û enfal û veguhastin û kavilkariyê û guherîna demografiya Kurdistanê, wekî bername û stratejiya xwe bi rê ve birine. Her lewra em dibînin ku tevgera rizgarîxwaziya Kurd jî bi dirêjahiya dîrokê, di nava xebat û berberekaniyeke dijwar de bûye, di hemberî rejîmên herî hov û dagîrker, û yên yek li pey yekê, û kariye tevî fedakarî, qurbanîdan û evraz û nişîvên zaf, nasnameya xwe biparêze.

Tevgera Kurdî bi giştî tevî xebata çekdarî, ji hemû biyavên xebata siyasî, dîplomasî û kulturî mifahê werdigire. Lê di Kurdistanê de bi sedema siyaset û stratejiya pilandarêtî ya rejîmê bo asîmîlekirina çanda neteweya me, û milîtarîzekirina Kurdistanê, xebata çandî di Kurdistanê de digel astengiyan berbirû bû. Tevgera rizgarîxwaziya Kurd jî, bi giştî li gora îmkan û derfetê, hertim wekî yek ji biyavên xebatê girîngiyeke taybetî dane tevgera çandî.

Lê rewşa xebatê û dijwariya xebatê û dijwariyên ser riya xebatê gellek caran bandora xwe li ser vê biyavê ji bizava çandî û kulturî hebûye. Xweragirî û îradeya bilind ya mafxwazane ya neteweya me, di piraniya qonaxên dijwar ên xebatê de, çand û kultura Kurdî di hemberî siyaseta asîmîlasiyona dagîrkeran parastiye, û pîlanên

---

### »»» Nûçeya manşêtê

**Roja Duşemiyê 16`ê Octoberê, Heşda Şe`ibî û Spaha Îraqê bi piştevaniya Spaha Pasdaran êrîş kirin ser Kerkûkê. Piştî bûyerên karesatbarên Başûra Kurdistanê di çend rojên borî de, çend aliyên Rojavayî piştevaniya xwe bo Kurd eşkere kirin, û bêhelwestiya Amerîka û Ewropayê şermezar kirin, li ber êrîşa li dijî Başûra Kurdistanê.**

Çar kongiresmenên Amerîkayî bi navên "Ralif Abraham, Marşal Bilakbêrn, Carîd Pols, û Mayk Galager" nameyek ji Wezîrê karê Derve ê Amerîkayê re şandine, û tê de daxwaz ji navbirî kirine, ku di dema herî zû de, bi berçavgirtina tewahiya riyên berdest, rêgiriyê bike ji wan êrîşan ku ji aliyê milîşên Şî`e bi piştgiriya Amerîkayê ve li ser Herêma kurdistanê têne kirin.

Her di vê derheqê de "Royterz"ê jî di raporekê de belav kiriye, ku berpirsên Îsraîlê ragehandine ku Netanyaho hefteya borî bo piştevaniya Kurd û nehêştina gefên li ser Herêma Kurdistanê pêwendiya telefonî digel Angêla Mêrkl û Potîn pêk aniye, û karbidestên Îsraîlê bas ji vê kirine ku Netanyaho labîtiyê bo Kurdên Îraqê dike, da ku gefa Îraqê li ser Herêma Kurdistanê vêde bibe.

Herwisa Netanyaho digel Feransayê li ser kêşeyên niha ên Kurdistanê axaviye. Nûçegihanya "Royterz"ê bas ji vê jî kiriye, ku "Meîr Bin şebat" rawêjkarê ewlehiya neteweyî ya Îsraîlê di derbarê pirsa Kurd digel karbidetsên Amerîkayî pêwendî encam daye. Berpirsekî Îsraîlî ku bi sedema hestiyariya pêwendiya Kurd û Îsraîlê eşkere nekiriye, ragehandiye ku Îsraîl berjewendiya "asayişê" digel Kurdistanê heye.

Herwisa nûçegihaniyên Herêma Kurdistanê eşkere kirine ku ofîsa



ragehandina Koşka serokatiya Rûsiyê (Kirimlîn) piştrast kiriye ku di pêwendiya telefonî ya serokwezîrê Îsraîl û serokê Rûsiyê de rewşa Kurdistanê piştî rapirsiyê mijareke gotûbêjê di navbera herdu aliyan de bûye.
Li gora vê nûçeyê berpirsên Rûsiyê bas ji vê kirine, ku Îsraîl nîgeran e ji rola Îranê di Îraqê de, û di vê derheqê de Rûsiyê nîgeraniyên Îsraîlê bi cidî wergirtine ku ew jî pêk tê ji hewldana bo kurtkirina destê Îranê di Îraqê de. Piştî van hewlan Wezareta Derve ya Amerîkayê ragehand ku daxuyaniyek belav kiriye, û rû li hikûmeta navendî ya Îraqê ragehandiye: Di navçeyên ku nakokî li ser hene de, hereketên xwe sînordar bikin.
Beşek ji çavdêrên siyasî jî li ser vê baweriyê ne ku yek ji armancên rejîma Îranê çêkirina şerê birakujiyê di nava Kurdan de, û zêdekirina alozîyan di vê navçeyê de ye, da ku bi vî rengî zêdetir bikare di xaka Kurdistan û Îraqê de cilîdanê bike, û pêngavekê nêzî xeta Şî`e bibe.

biyom ên wan kirine bilqa ser avê.

**Pirs: Urmiye û Kirmaşan û Loristan, wekî sê cihên stratejîk ên Kurdistanê her ji serdema destpêka sedsala 20`mîn û serhildana tevgera rizgarîxwaziya gelê me bûye armanca serkut û êrîşên herî giran ên arteşa Îranê, û piştî serkuta şoreşan bona vê ku bi tewahî bingehên şoreşê, di nava xelkê Kurd di van navçeyan de bêdeng bikin, dewleta navendî ya Îranê dest kiriye bi duyemîn êrîşa mezin ya xwe bi navê asîmîlasiyona çandî ku heya niha jî dom heye!!. Bo vê piroseya faşîstî ku ew qas nirx di heyama sedsala borî de ji me re hebû, ji aliyê çalakên siyasî û hizbên Kurdî ve bi başî nehatine tunekirin, û heya me bernameyek jî jê re nine, û gellek caran mirov hest dike ku di rastî de kesek awiran nade vê mijarê, jiber ku pirs ew e ku bona berbirûbûn û tunekirina asîmîlasiyona çandî ku hundirê jiyana ferhengî û fikrî û nasnameya Kurd kiriye armanc, bo bizava Kurd heya niha nekariye, bernameyeke kêrhatî hebe?**

**Bersiv:** Bajarên Kirmaşan, Urmiye û Loristan wekî sê herêmên girîng ên jeopolîtîk û stratejîk di Rojhilata kurdistanê de, bi dirêjahiya deshilatên dagîrker ên Kurdistanê di biyavên cur bi cur de hertim ketine ber êrîşên şovînîstan û xwastine ku nasnameya resen ya Kurdî di van herêman de ji nav bibin û nehêlin ku tu şûnwareke çand û kulturî ya Kurdî heya di warê mesebî de jî di van navçeyan de bimîne, û bi dirêjahya dîrokê, neyarên zal bi ser Kurdistanê de, serbarê tewahiya zext û zoriyê û pîlanên wan ên biyom neteweya Kurd bi morala xwe ya şoreşgerî hertim di çepera xebat û tekoşînê de, serbarê berberekaniya digel dijminên dagîrker ên Kurdistanê kariye ku nasnameya xwe ya neteweyî biparêze.

Tevgera Kurd jî serbarê zehemtiyên xebatê, li gora hêz û şiyanê girîngiyeke taybetî daye biyavê kulturî. Tevî rohnkirina derheq pilanên rejîmê di vê derheqê de bernameyên taybetî bi rê ve birine, û şeqama Kurdî han dane bo parastin û zindîragirtina çanda neteweyî ya xwe. Eşkere ye ku rejîm bi hebûna deshilatê û îmkanatên zaf, ji her cure metodekê bona serkut û jinavbirina nasnameya gelên blindest û yek ji wan neteweya Kurd tekoşînê dike. Rewta berdewam ya serkut û ewlehî kirina Kurdistanê derfeta her cure hewl û tevgereke ferhengî di navxwe ya welat de berteng kiriye. Çalakên ferhengî û rewşenbîrî berdewam li jêr zext û givaşê û destbiserkirin û gefa mirinê de ne, û di çarçoveya sîstemeke weha emniyetî û totaîltar de hewl dan û vegeşandina xebata ferhengî asteniyên zaf hene, lê bi xweşî ve çalakên ferhengî û gelê Kurd bi giştî tevî van hemû zehmetiyan şoreşgerane û mafxwazane ji bo parastin û nasnameya xwe tekoşînê dikin, û tevgera Kurd di Rojhilata kurdistanê de jî bi sedema zirûfa taybetî û dûrwelatiyê, û herwisa kêmiya îmkanatan, berdewam ji riyên cur bi cur ve, di hewla vegeşandina xebata ferhemgî û kêmrengkirina pîlanên dijî mirovî ên rejîmê de bûn bi taybetî bajarên Kirmaşan û Urmiyê û heya qasekjî li Loristanê de jî.

**-Pirs: Pêgeha tevgera Kurdî li Kirmaşan û Urmiyê hûn çawa pênase dikin? Hûn hevrengî û cudahiyan di navbera van du mezin bajaran de çawa dinirxînin?**

**Bersiv:** Bi giştî pêgeha bizava Kurdî li bajarên Kirmaşan û Urmiyê ji rewşeke gellek dijwar re derbaz dibe, û navend û rêkxiraw û çalakên ferhengî berdewam di bin gefa navendên ewlehiyê de ne. Her tevgerek ku rengdana çand û kultura Kurdî be, dikeve jêr pirsyarê, û rêkxerên wê di gel gefa girtin û kuştin û îşkencekirinê rûbirû dibin, û bi sedema rewşa ewlehiyê û berdewambûna siyaseta asîmîlasiyona rejîmê hewl û tekoşîna çandî nikare li rewşeke weha de bersivder be, serbarê wan hemiyan jî, em dikarin bêjin ku bileziya pêvajoya guhertinan û ber bi pêşveçûna asta zanyariyan û rewşenbîriyê ku Kurdistan bandora xwe li ser civaka kurdistanê daniye, û tevera çandî jî serbarê hemû wan astengiyan, berbirûyê siyasteên dijî kulturî ên rejîmê bûye, û di pêxema bilindragirtina nasnameya neteweyî de tekoşînê dike.

Bi sedema girîngî û taybetmeniyên jeopolîtîkî ên van du mezin bajaran, deshilatên yek li dû yekê û bi taybetî rejîma Îranê, hewla guherîna demografiya van navçeyan daye, û berdewam Kurd piştgih xistine, û heya di birêvebirina îdareya van bajaran de



**Dara Natiq:**

Bajarên Kirmaşan, Urmiye û Loristan wekî sê herêmên girîng ên jeopolîtîk û stratejîk hertim ketine ber êrîşên şovînîstan, û xwastine ku nasnameya resen ya Kurdî ya van herêman ji nav bibin

jî, rêgirî ji wan hatiye kirin. Pêkanîna nakokiyan di navbera pêkhateyên vî bajarî û veguhastina Kurdan û anîna pêkhateyên ne xwecihî bo van deveran yek ji siyasetên berdewam ên rejîmê bûye li Kirmaşan û Urmiyê. Helandina her cure şûnwareke neteweyî a Kurdî di van bajaran de, û jinavbirin û qedexekirina muzîk û hunerên Kurdî di van herêman û sepandin û vegeşandina kultura ne xwecihî û girîngî nedana bi wan di warê xizmetkirinê de, beşek bûye ji siyaseta hertimî a rejîmê.

**Pirs: Rasan wekî hêviya du dehikên borî ên gelê Kurd bona vejiyandina xebata xwe ya rizgarîxwazî çawa dikare ji aliyekî ve valahiya xebata ferhengî ya gelê Kurd tejî bike, û ji aliyekî din ve bibe pîlana serek ya tunekirina asîmlasyona ferhengî, û vê xebat ji rewşa piştguhxistinê ve bike xebata serekî ya me?**

**Bersiv:** Herekta vê carê ya pêşmerge ku du Buhara sala 2016`an bi koda Rasanê dest pê kir, di rastî de, pêkvegirêdana xebata bajar û çiya û vegerxistina sercem navendên girîng ên civaka Kurdistanê bo rizgarbûna ji dest dîlî û destbiserkirina azadî û demokrasî û xwestekên neteweyî ên gelê me bûn. Çend biyavbûna tevgera Rasanê di heyama destpêkirina wê heya niha kariye bandoreke berçav li ser vegerxistin û vejiyandina ser ji nû ya xebata rizgarîxwazane û bizava ferhegî û rewşenbîrî û Kulturî danê û guhertinek be di asta civaka Rojhilata Kurdistanê de. Bê guman berdewambûn û vegeşiyana vê tevgera nû jî dikare palpişteke bihêz be bo her tevgereke kulturî û di heman demê de, berbirûyê her cure siyasetke asîmîlasiyon û dijminkarane ya rejîmê bibe.

# Hevpeyvînek derheq siyasetên Amerîkayê di navçeyê de



**Dr. Îdrîs Ehmedî:**

**Siyaseta gotarî yan devkî ya Amerîkayê guheriye, lê hêşta siyaseta guherîna rejîmê di holê de nine, û amade nine ku carê nirxa guherîna rejîmê bide**

Dr. Îdrîs Ehmedî: Siyaseta gotarî yan devkî ya Amerîkayê guheriye, lê hêşta siyaseta guherîna rejîmê di holê de nine, û amade nine ku niha de nirxa guherîna rejîmê bide.

Kurdistanmedia: Malpera Kurdistanmedia li ser pirsa ragehandina stratejiya nû ya Amerîkayê li hemberî Komara Îslmaî ya Îranê û programa wê ya navikî digel birêz Îdrîs Ehmedî mamostayê zankoyê û şareza di siyaseta derekî ya Amerîkayê de hevpeyvînek pêk aniye.

Deqa gotûbêjê:

**Pirs-Trump stratejiya Amerîkayê li dijî rejîma Îranê xiste rû, û berevajiyê şirovekaran ku bas ji vê dikirin ku Bercam hildiweşe, û Spaha Pasdaran a rejîmaÎranê wê bixin nava lîsteya terorê de, lê berevajî wisa nebû, sedem vedigerin ser çi?**

**Bersiv:** Du sedemên sereke hene ku yekem rêkevtina navikî serbarê kêmasiyên xwe, û serbarê vê ku çareyeke demkî bo kirîza navikî ya Îranê bû, û nikare dawî car rê li ber Komara Îslamiya Îranê bigre, di warê bidestveanîna çeka navikî bi sedema piştevaniyeke navdewletî û heya radeyekê jî navxweyî ku bo vê rêkevtinê heye, destê îdareya Trump girê daye, amanca Obama û Îranê jî her ew bû ku destê îdareyên piştî îdareya Obama girê bide, û hilweşandina rêkevtinê dijwar û pirr buha be.

duyem jî Amerîka bedîleke baştir yan rohn ji bo vê rêkevtinê nîne. Bedela vê ku bas ji stratejiyeke tewaw dariştî bike, baştir ew e ku bas ji pêngavhilgitina ber bi darêtina siyaseteke nû ya Amerîkî li hemberî Îranê bê kirin, sedem jî ew e ku amanca dawî ya siyaseta Amerîkayê li hemberî Îranê zelal nebûye, û bi watayeke din, Amerîkayê niha jî digel de be, dawî rawestgeha siyaseta xwe di hemberî Îranê de rohn nekiriye.

Metirsiyên li ser asayişa navdewletî ku ji Komara Îslamî ve çavkanî digrin, tenê sînordar nînin bi pirojeya navikî ya Îranê, û Komara Îslamî piştevanê terorîzmê ye di cîhanê de, û herwisa li pêxema zalbûna bi ser Rojhilata Navîn de, pêkanîna nearamiyê kiriye bingeha sereke ya siyaseta derve ya xwe.



Xwezaya dîktatorî û tayifegerî ya rejîma Îranê li Tehranê tevî stratjiya berfirehxwaziya Îranê nekarî ji bilî terorîzmê, belavkirina tayifegerî û di domê de pêkanaîna neseqamgîriyê encameke din hebe. Eva ku cara dawiyê dikare dawiyê bi vê rewşê bîne, yan eva ye ku hemû welatên Rojhilata navîn teslîmî Îranê bibin û herwisa zilhêz di navçeyê de paşekêşeyê bikin, yan eva ku Amerîka û hevpeymanên wê rejîmê li Tehranê biguherin.

Min jêve ye ku siyaseta gotarî yan devkî ya Amerîkayê guheriye, lê hêşta siyaseta guherîna rejîmê di holê de nine, û amade jî nine ku di niha de buhaya têkçûna rejîmê bigre stûyê xwe.

**Pirs: Gelo hewlesta YE derheq ragirtina Bercamê li ser biryarên Amerîkayê bandore xwe hebûye?**

**Bersiv:** Bêguman wisa ye, siyaseta derve ya welatan, û zilhêzeke wekî Amerîkayê jî digel de be, hertim berbirûyê berbestên navxweyî û navdewletî dibe. Rewşa piştî 11`ê Septamberê jê derkeve, ku rewşeke rîzper bû wekî dibêjin "derwazeya derfetê" ji bo Ameîkayê vekiriye, da ku cesûrane tevbigere, û Amerîka bi sedema berbestên di asta navdewletî de, nikare hertim amancên stratejîk ên zelal hebe, yan jî bi hêsanî di kurtheyam de bigihîje armancên xwe.

Xeynî welatên Ewropî ku nîgeranê vê ne ku şerekî din di Rojhilata Navîn de, berjewendiyên wan ên enrjiyê bixe metirsiytê de, û herwisa bi sedema nêzîkatiya erdnîgariyê gellek penaber rû dikin wir, û Rûsiye û Çîn digel vê ku naxwazin ku Îran bibe xwediyê çeka navikî û çar caran piştevnî ji sepandina gemaroyan bi ser Îranê de kiriye, û di Konseya Asayişa NY de, ew jî li dijî hilweşandina wê rêkevtinê ne.

**Pirs: Li gora vê ku her sê mehan carekê dibe ku Tramp zanyariyên nû derheq Bercamê bide, û li dijî çalakiyên rejîma Îranê derkeve, egera wê heye ku Spaha Pasdaran bi fermî bikeve nava lîsteya terorê de?**

**Bersiv:** Ew eger heye, lê ji aliyekî ve girêdayî ye bi vê ku Spaha Pasdaran dirêjiyê bide kiryarên xwe ên terorîstî, û ji aliyekî din ve pêdeçûnek bi ser vê rêkevtinê de nehê kirin, ku hindek ji nîgeraiyên Amerîkayê bi xwe ve bigre.

Spaha Pasdaran zêdetir karê terorîstî bi wekalet dike. Ji niha şûnda zêdetir xwe diparêze, di vê derheqê de ku destê wan eşkere nebe di teroran de. Herwisa egera wê zêde ye ku pêdeçûn bi ser vê rêkevtinê de bihê kirin. Bi taybetî piştî vê ku Îran ji riya Eman ve amadeyiya xwe nîşan daye, bona pêngaveke wisa, lê Hesen Rûhanî pêdeçûnê bi ser rêkevtinê de qebûl nake. Welatên Ewropî jî bo rêgiriya ji hiloşandina rêkevtinê, ji niha şûnda zêdetir hewla dîplomatîk didin bona ragirtina vê rêkevtinê. Eger ew yek bihê kirin, dijwar dibe bo îdareya Tramp ku Spaha Pasdaran bixe nava lîsta terorê de.

Lê Amerîka hevdem dixwaze ku pirsa etomî ji tehlûkeyên din cuda bike. Herwisa egera vê zêde ye ku Tramp rêkevtinê nehilweşîne, û Îran her dirêjiyê bide nearamiyê di Rojhilata Navaîn de, û di bin rexneyên navxweyî de, spahê bixin nav lîsta terorê de. Ez bawer im ku rejîma Îranê dev ji siyasetên xwe bernade, lewra di dawiyê de li Rojhilata Navîn de, û di bin rexneyên navxweyî de, spahê bixin nava lîsta terorê de.

**Pirs: Endamên Kongireya**

»»» Dom R: 8

# Nerîna Lîderan




Barzanî: “Hikûmetên cîhanê li ber berjewendiyên xwe, qurbaniyên xelkê Kurdistanê ji bîr kirine, ku di şerê terorîstên DAÎŞ`ê de bexşîne ”.



Netanyaho: “Dibe ku Îran tê bigihîje ku em rê nadin pêgeha xwe ya leşkerî di Sûriyê de bihêz bike”!.



Nîkî Hêlî: “Rejîma Îranê henekan bi Konseya ewlekariyê dike”



John McCain: “Êrîşa li dijî Kurdan, serkevtineke bpo rejîma Îranê. Dibe ku em piştgiriya Kurdan bikin.”

## PDKÎ û Komeleyê daxuyaniyek hevbeş belav kirin




**PDKÎ û Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Îranê daxuyaniyeke hevbeş de belav kirin ku xelkê xebatkar û cesûr ê Kurdistana Rojhilat, di egera her pîlaneke Komara Îslamî li dijî hizbên Rojhilat, wê bersiva wan bidin, û bêdeng nabin.**

**Deqa Daxûyaniyê:**

**Kom û komeleyên navneteweyî**
**Civatên xelkê Kurdistanê**
**Dost û dilsozno**

Êrîşa Heşda Şe`ibî û Spaha Pasdaran bo ser navçeyên kêşe li ser di Kurdistana Başûr, ne tenê he rHerêma kurdistanê berbirûyê alozî û dubendiyê û zirarek zaf kiriye, belkû derfetek jî bo rejîma Komara Îslamî ya Îranê û hêzên terorîstî afirandiye ku ji van aloziyan mifaha ne bi cî wergirin, û hewl bidin ku derbê li hizbên Kurdistana Rojhilat bidin. Di vê derheqê de em bi hewce dizanin ku ragehînin:

Yekem- Em hemû destdirêjiyek û pîlangeriyeke Komara Îslamî ya Îranê li Herêma kurdistanê mehkûm dikin. Rejîma Îranê ne tenê her dijminê neteweyên Îranê, belkû serçaweya kirîzan û nearamiyan di Rojhilata Navîn de ye, û di Kurdistana Başûr de jî, xeynî aloziyê û duberekî çêkirinê, tu xêreke wê bo Kurd tunabe.

Duyem- Em bi mafê xwe dizanin ku bi hemû şiyana xwe ve, bona pûçkirina her pîlaneke vê rejîmê û bona tunekirina wê hewl bidin û hemû pêngaveke pêwîst di vê derheqê de em hilgirin.

Sêyem- Xelkê xebatkar û cesûr ê Kurdistana Rojhilat di egera her pîlaneke Komara Îslamî li dijî hizbên Rojhilat bersiva wan wê bidin û bêdeng nabin, û em wan xatircem dikin ku xortên wan ên pêşmerge di her egerekê de wekî hertim hemasеyên pirr ji şanazî li dijî dijminên gelê Kurd diafirînin.

Çarem- Em daxwazê ji Kurdên derveyî welat bi giştî û bi taybetî Kurdên Rojhilat dikin, ku bi şêwazên medenî û îroyîn pîlanên rejîmê bo ser hizbên Rojhilatî û Kurdên Rojhilat ên rûniştiyê Başûr bisekinin.

Pêncem-Em daxwaz ji hikûmeta Herêma Başûr a Kurdistanê û xûşk û birayên xwe û bi taybetî ciwanan û azadîxwazan û navend û kesayetiyên ayînî di vê beşê de dikin ku îznê nedin Komara Îslamî gefên xwe li dijî Başûra Kurdistanê wekî derfetekê bibîne, bona êrîşa li ser kempên hizbên Rojhilat û endam û alîgirên wan di Başûr û di hemberî destdirêjiyên wê rejîmê de bêdeng nebin.

Şeşem- Em daxwazê ji endam û alîgirên hemû hizban dikin, ku digel amadebûn û li ser hestbûnê, xwe ji zimanê tund derheq yektir û endam û alîgirên parçeyên din dûr bigrin, û hewl bidin zimanê parastina berjewendiyên neteweyî û giştî hebin, ne birîndarkirina hevdu.

Heftem- Em daxwazê ji kom û komeleyên navneteweyî û NY û nûneratiya welatan di Kurdistana Başûr de dikin, ku li hember destêwerdanên Komara Îslamî di Îraq û Kurdistanê û kiryarên Spaha Pasdaran û gefên wan li ser hizbên Rojhilat û cane xelkê nava kempan de bêdeng nebin, û helwesta wan hebe.

**PDKÎ**
**Komeleya Şoreşger ya Zehmetkêşên Îranê**

**30.07.1396**
**22.10.2017**

## Rejîma Îranê caş û kirêgirtiyan ji sifreya xwe bêpar dike

**Berpirsên rejîma Îranê di Kurdistana Rojhilatê de, baweriyê bi caş û kirêgirtiyên xwe nake, û bi hêcetên cur bi cur wan li ser kar derdixe.**

Li gora rapora gihîştî malpera Kurdistanmedia, baregeh û navendên ewlekarî û leşkerî yên rejîma Îranê, di Kurdistan Rojhilat de, bi hêcetên cur bi cur û herwiha bawerîpênekirina bi kirêgirtiyên xwe, nêzî 400 kes ji wan, ji qirêjxweriyê bêpar kirine.

Nûçegîhanê malpera Kurdistanmedia di vê derheqê de ragehandiye ku, ev kirêgirtiyên ku ji aliyê rejîma Îranê ve hatine derxistin, xelkê bajarên Seqiz, Bane, Dîwandere, Kamyaran û Meriwanê ne.



Li gora vê raporê, 117 kes ji wan kirêgirtiyên derxsitî xelkê bajarê Bane, û 40 kesên din jî xelkê bajarê Seqizê ne, û yên din jî xelkê bajarên din yên Kurdistana Rojhilatê ne.

Nûçegîhanê malpera Kurdistanmedia di derbarê sedema derxistina wan kirêgirtiyan ji aliyê rejîmê ve, daye zanîne ku, berpirsên rejîmê, sedemên derxistina wê koma kirêgirtiyan vegerandiye ser hêcetên ecêb weke: hebûna xizm û kes û karên wan caşan li derveyî welat, karkirina wan li ser sînoran, hatûçûnkirina Başûrê Kurdistanê û wergiritina bertîlê.

»»» Doma gotara R: 6

**Amerîkayê serbarê vê ku piştgiriya biryara Tramp kirin, lê rexne jî ji vê yekê girtine, ku ew kiryarên Tramp gellek piratîkî nînin, û dibin sedema bihêzbûna Îranê, gelo boçûna we çi ye?**

**Bersiv:** Ew rexne qebûlkirina vê ye, ku Amerîkayê tu bedîlek bo vê rêkevtinê nine. Taybetmendiya siyaseta derve ya îdareya Tramp bi taybetî di hemberî Îranê de, pêk tê ji giranîxistina ser siyaseta gotarî yan devkî. Her demekê aliyekî siyasî giraniyê dixe ser siyaseta devkî, zêdetir di nebûna bijardeya pirtaîkê de ye.




Di siyaseta tund ya devkî de bi bêy vê ku kar bo armanceke rohn û zelal ya stratejîk bê kirin, dikare bi vê watayê di berjewendiya Îranê de be, ku Amerîka ji hevpeymanên wê dûr bixe. Renge mebesta wan ji bihêzbûna Îranê ew be. Herwisa neteweya Fars zêdetir pişta rejîmê digrin.

Lê ez wisa dibînim ku siyaseta îdareya Tramp, Îranê lawaz dike. Îran dixwaze ku bi mercên xwe di civaka navneteweyî de ew bihê qebûlkirin, û di biryaradana navçeyî û navdewletî de para xwe hebe. Siyaseta Obama rewş bo vê yekê xweş kiribû, lê siyaseta Tramp Îranê ji vê yekê bê par dike, û ez pêşbînî dikim ku dawî car heya paşekêşe jî bi Îranê bê kirin di vê navçeyê de. Bala xwe bidnê ku kardaneweya Rûhanî ew yek selimand. Hekî siyaseta gotara îdareya Tramp bê bandor be, seranên Îranê bi vî rengî têk nediçûn.

**Pirs: Piştevaniya du welatên wekî Erebistan û Îsraîlê dikare çi bandorekê li ser Îranê û biryarên bê yên Tramp derheq Îranê danê?**

**Bersiv:** Stratejiya Amerîka di Rojhilata Navîn pêk tê ji ragirtina hevkêşeya hêzê. Di gellek ciyan de min gotiye ku ew guhartin di stratejiya navçeyî ya Amerîkayê di Rojhilata Navîn de li dewreya duyem ya îdareya Bûş de rû da, û Obama û Tramp dirêjiyê didin vê stratejiyê . Stratejiya dewreya yekem ya îareya Bûş stratejiya guherîna rejîmên dîktator û belavkirina demokrasiyê bû. Paş derbexwarina vê stratejiyê li Îraqê, Amerîka kar bo vê dike, ku tu hêzeke neyar bi ser navçê de zal nebe.

Di vir de ye ku Amerîka hewl dide bi serkirdayetiya xwe, hevpeymaniyeke navçeyî li dijî Îranê pêk bîne. Erebistan û Îsraîl du aliyên sereke ên vê hevpeymaniyê ne. Erka wan ew e ku di hinek cihên navçeyê de, Îranê neçar bi paşvekêşanê bikin. Lê Yemen û heya astekê jî Sûriye jê derkeve, wan du welatan karekî wisa nekirine. Rastiya wê ew e ku lêdana Husiyan di Yemenê de û lêdana Hizbullahê û Heşda Şe`ibî di Sûriyê de, zêdetir rêgirin e ji zêdexwaziya Îranê, ne paşekêşepêkirina wê. Meydana serekî bo paşekêşekirina bi Îranê di Îraqê de ye, lê li wir siyaseta şaş ya Amerîka û Erebistanê nekariye heya niha tu deskevtek hebe.

Helbet guman têde nine, ku Amerîka di qonaxa niha de hewcehiya wê bi Erebistan û Îsraîlê ye. Bila ez vê yekê jî pêve zêde bikim, ku stratejiya ragirtina parsenga hêzê wisa dixwaze ku hekî hevalbendên navçeyî ên Amerîkayê nekarin parsenga hêzên ragirin, dawî car Amerîka xwe ji bo destêwerdana leşkerî amade bike, bona ragirtina parsenga hêzê. Ew yek ew stratejiya bû ku Amerîkayê di şerê Kendawê de cîbicî kir.

Zêdexwaziya rejîma Îranê sînoran nas nake. Hekî welatên navçê nekarin paşekêşeyê bi Îranê bikin, di dûrheyam de egera wê zaf e ku Amerîka li derveyî sînorên Îranê li Spaha Pasdaran û hêzên kirêgirtî ên wê bide. Cudahiya Îranê digel Îraqa serdema hikûmeta Be`is di vê de ye ku zêdetir bi wekalet şer dike, heya vê ku hêza xwe bi kar bîne.

**Di vir de ye ku Amerîka hewl dide bi serkirdayetiya xwe, hevpeymaniyeke navçeyî li dijî Îranê pêk bîne**

Lewra di çarçoveya stratejiya ragirtina parsenga hêzê de, dikare şahidê şerê Amerîkayê û hevalbendên wê bin li dijî Hizbullahê û Heşda Şe`ibî. Alîkariya Erebistan û Îsraîlê bo vê mebestê gellek girîng dibe.

## Di şaredariya Tehranê de destpîsiya malî bêdadiyê dike

**Endamekî şêvra bajarê Tehranê ragehand ku zêdetir ji 130 hezar kesî hiqûq ji şaredariyê werdigrin.**

Mecîd Ferahanî endamê Komîsyona Bername û Bûdceya şêvra bajarê Tehranê ragehand, di demekê de ku 68 hezar kes karsazên şaredariya Tehranê ne, lê zêdetir ji 130 hezar kesî hiqûq ji şaredariyê werdigrin. Şaredariya Tehranê her mehê nêzî 550 milyard Tûmenî hiqûq dide karsazên xwe.

Navbirî derheq wan kesên ku pere werdigrin, lê ser bi şaredariyê nînin got, bo mînak tenê di şirketa avakirina metroyê de, zêdetir ji çar hezar kesî bi nav karsaz in, lê bêkar in.

Karbidestên herî payebilind ên rejîmê ku berdewam bas ji dadperweriyê û xebata li dijî destpîsiya malî û diziyê dikin, bixwe kesên herî gendel in, û piraniya wan bi diziya serwet û samana welat bûne milyarder. Ew yek di demekê de ye, ku her li gora amarên rejîmê bixwe, %11 ji xelkê Îranê di bin xeta hejariya tewaw de ne. Xeta hejariya tewaw, wate wan kesan heya hêz û şiyana kirîna hewcehiyên herî destpêkî û bingehîn ên jiynê jî nînin, û tewaw desteng in.



# Daxûyaniya Deftera Siyasî ya PDKÎ derheq rewşa Mihemed Nezerî

**Deftera Siyasî: Komara Îslamî wekî rejîmeke îdeolojîk ya serberedayî, tu mafekê ji bo mirovan û pêkhateyên civakê rewa nizane, û heya yasayên xwe ên paremayî jî binpê dike**



Komara Îslamî wekî rejîmeke îdeolojîk ya serberedayî tu mafekê bo mirovan û pêkhateyên civakê rewa nizane, û heta yasayên xwe ên paşvemayî jî binpê dike.

**Kurdistamedia: Deftera Siyasî ya PDKÎ bi boneya gireva girtiyên siyasî ên Kurd, Mihemed Nezerî daxuyaniyek derkir, û tê de daxwaz ji navbirî kir ku dev ji girevê berde.**

**Deqa daxuyaniyê weha ye:**

Daxuyanî bi boneya gireva Mihemed Nezerî

**Kom û civatên mirovdost**
**Xelkê azadîxwaz ê Îranê**
**Hevwelatiyên Kurd**

Heyama zêdetir ji 80 rojan e ku girtiyê siyasî Mihemed Nezerî dest bi grieve kiriye, û tenê daxwaziya wî cîbicîkirina yasayên Komara Îslamî ye derheq heyama hukmê xwe.

Navbirî xelkê Sayîn Qelayê ye, û temenê wî 46 sal e, û heyama 24 salan e ku di girtîgehê de ye, û hukmê nerewa bi ser de hatiye sepandin, û tenê tawanek ku Komara Îslamî xistiye stûyê wî, piştevaniya ji mafê Kurdan û endametiya di hizbeke Kurd de ye.

Ew li ber piştevaniya ji mafê Kurd,24 sal dibe ku bêy mirexesî (îzinwergirtin) di reşçalên rejîmê de hatiye ragirtin, û berpirsyarên rejîmê heya li gora yasayên Komara Îslamî bixwe jî digel wî tevnagerin, û zilmeke zêdetir lê dikin.

Li gora yasayên Komara Îslamî diviya ku heyama destbiserkirina wî jî, kêmtir ba, û çend salan berî niha hatiba azadkirin, û Mihemed Nezerî li gora yasay sala 1392`an rejîmê daxwaza dubare dadgehîkirina xwe kiriye, lê rejîmê bersiva wî nedaye, lewra di roja 8`ê Gelawêjê de dest kiriye bi girevê û tenê daxwaza wê dike ku yasayên Komara Îslamî li ser wî bêne cîbicîkirin.

Kom û komeleyên cîhanî û mirovdost

Em wekî PDKÎ daxwazê ji we dikin ku dengê mafxwaziya girtiyê siyasî Mihemed Nezerî bin, û zextê bixin ser Komara Îslamî ku guh bidin Mihemed Nezerî, û daxwazên wî cîbicî bikin, û hindî zûtir bê berdan.

Em rû li girtiyê xebatkar û mafxwaz Mihemed Nezerî dikin û daxwazê jê dikin ku di vê rewşa dijwar ya cendekî ku tê de ye, piştî zêdetir ji 80 rojan girevgirtinê, dev ji vê girevê berde, jiber ku Komara Îslamî ya stemkar jiyana tu mirovekî jê re girîng nine, û buhayê nade tu xwestek û canekê, lewra li ber parastina canê xwe em daxwazê jê dikin, ku dev ji girevgirtinê berde.

**PDKÎ**
**Deftera Siyasî**

**29.07.1396**
**21.10.2017**

# Gola Urmiyê dibe qurbaniyê gendeliya berpirsyaran

**Berdevkê Navenda Vejiyandina Gola Urmiyê di nameyekê de bo Rûhanî, berpirsên pêwendîdar bi pirsa vejiyandina gola Urmiyê bi tundî rexne kirine.**

Mes`ûd Tecrîşî Berdevkê Navenda Vejiyandina Gola Urmiyê di vê nameyê de ragehandiye ku Wezareta "Enirjî" û ya "Cîhada Keşawerzî" bi tu awayî alîkariya wan nakin, û pejirandiyên Navenda Vejiyandina Gola Urmiyê cîbicî nakin.

Navbirî ragehandiye ku pêşbîniyên dewletê derheq vejiyandina gola Urmiyê rast derneketin, û berevajî ava wê evsal li gor sala borî zêdetir kêm bûye.

Li gora gotina navbirî, dewleta Rûhanî 1800 miyard Tûmen danîbû bo Navenda Vejiyandina Gola Urmiyê, lê heya niha tenê 675 milyard Tûmen milyard Tûmen hatiye dan.

Axavtinên cur bi cur û dij bi yek, ên berpirsyarên pêwendîdar ên rejîmê, derheq vejiyandina gola Urmiyê, bûye sedema vê ku xelk zanyariyên rast dest wan nekevin, û êdî baweriyê bi ragehandin û daxuyaniyên wan nekin.

Ew yek bêserûberiyeke zaf û nakokiya zêde di nava wan berpirsyaran de nîşan dide, û bê guman di rewşeke bi vî rengî de, xelk nikare çavnihêrê başbûna ava gola Urmiyê be.

Gola Urmiyê ku duyemîn gola mezin ya şor di cîhanê de ye, bi sedema xemsariya rayedarên rejîma Îranê ketiye wê rojê de, û bi hişikbûna vê, jîngeha Urmiyê wê rastî nexweşiyên gellek metirsîdar bê, û dikare rewşa tendurustiya xelkê herêmê jî têk bide.



# Sê pirtûkên derbarê Kurdan de hatin qedexekirin

**Li Tirkiyê 3 pirtûkên derbarê kurdan de hatine nivîsandin, bi hêceta nîşaneyên "rêxistinên terorî" di nava xwe de digoncivînin hatin qedexe kirin.**




Li gor nûçeya rojnameya Duvarê pirtûka Fehîm Taştekîn ya bi navê "Rojava/Dema Kurdan" pirtûka Faysal Dagli ya bi navê "Birakujî" û pirtûka Aytekin Gezicî ya bi navê 'Dîroka Kurdan' hatine qedexekirin.

Dadgeha Cezayê Sûlh ya Kolika Semsûrê di derbarê hersê pirtûkên navborî de biryara qedexekirina firtoinê û komkirina wan derxist.

Li gorî dadgehê ew pirtûk nîşaneyên rêxistinên terorî di nava xwe de digoncivînin.

Pirtûka Faysal Dagli di sala 1994an de ji Weşanxaneya Belgeyê, pirtûka Aytekin Gezicî sala 2013an ji Weşanxaneya Tukuyê û pirtûka Fehim Taşkin jî par ji Weşanxaneya İletişimê der çûne.Rudaw

# Dîroka Cizîrê wê çap û belav bibe

**Pirtûkek li ser dîroka Cizîra Kurdistana Rojava, ji aliyê nêvîskarekî neteweya Kurd ve, hatiye amadekirin.**

Li gora raporên belavbûyî, "Silêman Osman Ewdo" naskirî bi "Konê Reş", xelkê Kurdistana Rojava, pirtûkek derheqê dîroka Cizîra Rojava a Kurdistanê, ji bo çap û belavkirinê amade kiriye.

Wî nêvîskarî di gotûbêjekê de digel medyayan de ragehandiye ku, pirtûka dîroka Cizîrê bi zimanê Erebî nivîsiye, û ji ber vê yekê ku dîroka vê devera Kurdistanê, ji hemû Ereb û cîhanê re bidim naskirin, destpêka pirtûkê ji sala 1401`an ve de dest pê dike, û heyanî sala 1965`an bi xwe ve digire.

Konê Reş daye zanîn ku, xeyrî vê pêrtûkê, 6 pirtûkên din wî nivîsîne û amade ne ji bo çapkirinê, lê belê ji ber nebaşbûna rewşa aborî ,min nekariye çap bikim, yek ji wan pêrtûkan li jêr navê Bîrname de ye, ku bas ji çanda Kurdistana Rojava dike û bi zimanê kurdî jî hatiye nivîsandin.

Silêman Osman Evdo, naskirî bi Konê Reş, di sala 1953`an di Kurdistana Rojavayê de hatiye dinê, û qonaxên dersxwendinê di Qamişlo û Hesekê de tewaw kiriye û herwiha di sala 2014`an de xelata Cîgerxwîn ji ber afirandina helbestan wergirt, û heyanî niha jî 25 pirtûk çap kirine, û 7 pirtûkên din jî wî ji bo çapkirinê amade kirine.



# Semînarek li ser jiyana Muderisî bi rê ve çû

**Li Zanîngeha Peyama Nûr ya Merîwanê semînerek li ser jiyan û berhemên Mele Ebdulkerîm Muderis hate sazkirin.**

Di semînerê de ku bi hevkariya Encumena Çandî – Edebî ya Merîwanê û bi amadebûna çendîn şarezayên wêjeyê bi rê ve çû, behsa jiyan, berhem û herwiha bandora berhemên Mele Ebdulkerîm Muderis li ser ziman û edebiyata Kurdî hate kirin.

Weke din di semînerê de behsa rola berhemên Mele Ebdulkerîm Muderis li ser pêkanîna atmosfera tifaq û pêkvejiyana navbera aliyên ciyawaz ên îslamî hate kirin.

Di jînenîgariya Mele Ebdulkerîm Muderis de hatiye diyarkirin ku li Hewramana Başûrê Kurdistanê jidayîk bûye, lê beşek ji nivîskaran dibêjin, li gundekî Merîwanê jidayîk bûye.

Mele Ebdulkerîm Muderis di sala 1901ê de hatiye dinyayê û di sala 2005an de koça dawî kiriye. Di 104 saliya xwe de zêdetirî 60 berhemên zanistî, edebî û olî bi zimanê Kurdî û Erebî nivîsandine.Rudaw



# Zimanê Kurdî

Mijar: Hoker

Nasîn:

a. Ew peyvên ku rengdêran, bi taybetî çalakiyan û ji aliyê erkî ve peyvên wek ên xwe; di hevokan de rêmanên wan xurt, kêm an bi sînor dikin re hoker(hevalkar) tên gotin. Ev peyv, çalakiyan; bi çawanî, bi dem, bi cih û bergeh, bi mêjer, bi şanîdan, bi daxwaz, bi guman, bi erêkirin, bi neyînî û bi pirsên xwe didin nasîn.

b. Ev peyv, bi bikaranînên xwe; ji aliyê wateyan ve di lêkeran, rengdêran û peyvên wekî yên xwe de guhartinan tînin holê.

c. Nav, rengdêr, lêker, daçek û hwd, wek hokeran bikar tên. Bi erkî dibin hoker lê her hoker; ne nav in, ne rengdêr in, ne lêker in û ne hwd in.

ç. Bi gelemperî peyvên ku di binyatên xwe de hoker in, ev ne guhêrbar in.

Destpêk

Pirs : Di vê tekstê de bilî yên hatine şanîkirin, hoker hîn hene?

Mînak : Ji tekstan :

Her gava ku borîzanan dest pê dikir, digot ku ev sîstem nayê guhartin. Ev dinya nayê guhartin. Ev gêrîk û ev fîl nayên guhartin. Wan di piyêsên xwe de, di helbestên xwe de, di stranên xwe de, di roman û çîrokên xwe de, her ev tişt digotin. Gêrik gurê gêrîkan e. Ev dinya dinyaya derewîn e, dawiya wê tûnebûn e. Wan digot ku ev dinya, ev dinyaya xerab, nemerd û qirêj ne hêjayî jiyanê ye. Hewldanên ji bo guhartina vê dinyayê, ji ehmeqtiyê jî wêdetir, hewldaneke vala ye. Ma li vê dinyaya derewîn a ku tu tişt tê de nayê guhartin, hewldana ji bo guhartina wê, ne ehmeqtî ye, lê çi ye? Tu gêrîk nikare li vê dinyayê bextiyar be.

Ma qey fîl tevî wê laşgirsiya xwe jî bextiyar in? Siltanê Fîlan bi xwe jî ne bextiyar e. Helwêsta ku dê gêrîkan bextiyar bike ew e ku divê gêrîk ji bo Siltanê fîlan bi canfedayî bixebitin, bixebitin û dîsa bixebitin û ji bo Fîlistanê, canê xwe fedayî birayên xwe yên gêrîk bikin. Wan, ji tiştên ku gêrîkan ji bo fîlan û Siltên dikirin, bê rawestan her nimûne didan. Belê, gêrîk dê bûbûna fîl jî,
ji xwe ew fîlên lanetlêhatî bûn. Her gêrîk ji berê de fîlek bû, lê lanet li wan hatiye û wiha wek gêrîkan hatine piçûkkirin. Her gêrîk bi xebatê û bi destûra Siltên dikare bibe fîlek. Belê, bi destûra Siltên... Siltan dikare fîlîtiyê bide her gêrîkê jêhatî. Gêrik dikarin bi destûra Siltên bibin fîl. Lê ew dikarin bi tenê, bi qasî gêrîkan bibin fîl. (Siltanê Fîlan, Y. Kemal)

Ev peyv hoker in : Ne, bextiyar, qey, bi canfedayî, dîsa, bê, belê, berê, wiha, bi xebatê, bi tenê, bi qasî ... (Dom heye)

## Tiştonek



A: Mahir Berwarî

-Hem xesî ye, hem bûk e.
Bersiv: Jinekê xesiya hey û ew bi xwe jî xesiye.

- Li mam heye li xal tune, li mal heye li bal tune.
Bersiv: (* Pîta (m)e ye.)

- Şêstu du ker li serê milekê kirne der, şeş guh û sê ser.
Bersiv: (* Şêstu navê mirovekî ye li gel du kerên xwe.)

C. Lîztin bi zilkên şixartê:
Ev beşe jî nakeve di xana meteloka da, lê ji ber ku girêdan heye bi bîrkariyê ve, min bi fer zanî li vir belavkim.
Zorok çend darkên şixatê diînin û bi wan darka dilîztin.
Gelek cara çend darka bihevra çarguşa, sêguşa an lakêşa pêkdiînin, paşî destkariyê di hijmar û cihê darka da dikin,
dibe cara bi rengê guşey/kujî jî bilîzin û bigurin. (30)

30 . Sinêle û mezina li gunda yarî bi berka jî dikirin mîna: ``Damanê,
Ji bo pirtir zelalkirnê dixazim du mînaka bînim: (31)

- Ger li wênê li xarê binêrî, 6 çarguşe ji 17 darkên/zilkên şixartê avakirne. Tu yê azadî 5 darka ji vana rakey û ji yên mayn (15 darka) sê çarguşa avakey?
Bersiv: →

Têdîtin: Amadekar destkariya devoka metelokan nekiriye

**Xwendevanên hêja! Hûn dikarin bersiva tiştonekan bi riya E-Maila Agiri2003@gmal.com ji me re bişînin**

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (312)


## Her ji Kerkûk dest pê dikim

**N: Dildarê Mîdî**

**Min pênûsên xwe de girt ji pêjeyên neqandî**
**Tabloyek min neqişand bi zêrê zer helandî**
**Kerkûk mishefa Kurda min bi desta pelandî**
**Her wê pîroz bimîne parastî û hilandî**

**Biryara xwe me daye veger ji dozê nema**
**Gul pişkivîn ji xara xemlîn şax û lema**
**Me bi xwînê avda ye mîna cobar û çema**
**Çi qurbanî bête dan hîç li nik me nexeme**

**Tu hatiye parastin bi destê qehremana**
**Bi cûş û kelecanê gel dakete meydana**
**Şêra mil dane hevdû baz hatin ji zozana**
**Cangoriyê Kerkûk in ew dilê Kurdistane**

**Nameya biratiyê ji bo we me şiyandî**
**Destê xwe me dirêj kir bi aşitî hejandî**
**Bersiv we daba agir hinavê we kelandî**
**Çavê we çû patikê Malikî û Ebadî**

**Digel Heşda xwe ya reş hûn mîna gura hare**
**Êrîş we da li ser me êrîşeke xedare**
**Lê Kurd ne yê berê ye her hazir û li kare**
**Kurdistanê her ew ware lê qet ne ew bihare**

**Em Kerkûkê berdandin ger yek ji me bimîne**
**Pêmerge ser bilinde bejna xwe natewîne**
**Sîla yekem li te de devê te tije xwîne**
**Herdem bijî Kurdistan serbixwe dê bimîne**



## Kerkûk, te ji nemerdan vedigerînim!

**N: Besam Mistefa**

Ey Kerkûkê, naz û bûkê, xeml û nîşana minî
Wey pepûkê, jar û çûkê, şûr û mertala minî

Ey delalê, rû şemalê, pak û jalê tu gulî
Wey hevalê, ol û malê, nav û nîşana minî

Ey nazedarê, bûka salê, cîh û warê me Kurda
Wey şepalê, pir cemalê, Zîn û Şîrîna minî

Kerkûka min, ger tu hebî, Çîn û Maçîn ma çine?
Çîn û Maçîn, Hind û Yûnan, Mîd û Mîtana minî

Dil tuyî, quble tuyî, cerg û parsû û kezeb
Gurçikî, herdû pişik, laş û hem canê minî

Dîlbera min, heyv û rojî, xecxecoka ber dila
Bav û dayê, xwişk û birayê, da û dapîra minî

Wey sorgulê, pişt û milê, kotira Deşta Xeten
Baba Gurgur, Bay Hesen, neft û petrola minî

Hey çelengê, şox û şengê, Qudis û Medyaya qeşeng
Kobanî, Efrîn û Amûd, Wan û Batmana minî

Wey benazê, rist û sazê, gangiloka van cihan
Leyla Qasim, Leyla Zana, Xec û Zîlana minî

Sed Holako, Teymûr Leng, Şah û Qeyser û çewser
Qet nikarin te dagîr kin, Tîr û Keywana minî

Wey li min û vê heyamê, dem û dewrana dizan
Te ji nemerdan vedigerînim, taca ser taca minî